
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 940 09-Sibat- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني
http://www.ronahi.net

# Gelo ev çi ye?

**Em bi kulîlkan, krîstalên gelek tiştan û nexasim jî yên qeşa û berfê dizanin ku hunermenda herî jêhatî xweza bixwe ye.**



Ev wêneyê ha ji vîdeoyekê hatiye girtin û diyar e heman hunermend li ser kar e. Lê gelo kesekî tê derxist ka ev çi ye, yan jî çi ne?
Ew gilover, dilopeke avê ye. Di navê de jî weke ku bi rêkûpêk hatibin danîn bi hezaran xîşkên xweşkok ên li hev badayî hene. Di vîdeoyê de ev xîşkên xweşkok avjeniyê dikin. Diçin navenda dilopê û dîsa jê dûr dikevin. Na na, ew ne tîrêjên elektrîkê ne jî. Ew zindî ne.
Ew cureyekî kurman ên hûrik in. Yan jî cûreyekî dişibe kurman. Ji wan re "nematod" tê gotin û qederê 25 hezar jêrcûreyên wan hene.
Pirraniya wan jî parazît in, xwe ji zindiyên din têr dikin. Hinekên din xwe bi mikrobên piçûk têr dikin, yek ji wan jî "T. acetî" ye. Ji "T. Acetî" re bêhtir kurmikê sîrkeyê tê gotin. Ew dikare hema hema li her cihê mirov dikare lê bifikire ku mikrob lê hebin, hene û xwe bi van mikroban xwedî dikin.
Di vê dilopa avê de jî bi hezaran kurmikên sîrkeyê hene. Komek zanyaran dixwest lê bikole ka çawa ew jî weke gelek teyr û çivîkan, dikarin bi refên xwe sînkronîzekirî bifirin. Wan di nava dilopek avê de dîmenê bi hezaran kurmikên sîrkeyê di bin mîkroskopê de girt û ev wêne jî kêliyek ji wî dîmenî ye.
***Ozgûr Polîtîka***

# Jinekologa pêşî ya jin: Agnodice

Li cem civakên hişmendiya zilam di wan de serdest, pêşketina xebata jinan zehmet e. Dîrokê her tim serketinên zilaman nivîsîne.
Li cem civakên hişmendiya zilaman di wan de serdest, pêşketina xebata jinan zehmet e. Dîrokê her tim serketinên zilaman nivîsîne. Lê li gel vê yekê jî, jin li ber xwe didin û navê xwe dinivîsin di rûpelên dîrokê de.
Yek ji wan jinên têkoşer, Agnodice [Agnodîs bixwîne] e. Ew ji serdema kevnar a Yewnan e.
Agnodice da ku xeyalên xwe pêk bîne, cinsiyeta xwe vedişêre û bi porrê kurt û cilûbergên zilaman, wekî ku zilam be, dest bi fakulteya tibbê dike.
Rojekê li kolanên Atînayê digere û di rê de dibîne ku jinek li ber anîna zarokê ye. Nêzîkî jinê dibe û dixwaze alîkariya wê bike. Lê ji ber ku jin bawer dike ku ew zilamek e, naxwaze alîkariya wê bike. Agnodice mecbûr dimîne ku bedena xwe nîşanî wê bide da ku piştrast bike ku ew jî jin e.



Piştî vê bûyerê hemû jinên li ber zarokanînê, diçin kargeha Agnodiceyê. Doktorên zilam gava dibînin ku nexweşên Agnodice zêde dibin, nerazîbûna xwe nîşan didin. Piştî demekê, bêbextiya tacîzkirina jinan li Agnodiceyê dikin. Ji ber vê, Agnodice tê dadgehkirin. Dadgeh biryarê dide ku Agndiceyê bi dar ve bike. Piştî biryara dadgehê Agnodice mecbûr dimîne ku li xwe mikûr were û cinsiyeta xwe eşkere bike. Lê ji ber ku doktoriya jinan jî wê serdemê qedexe ye, vê carê jî ji ber vî sûcî dadgeh biryara bidarvekirina wê dide.
Lê seranserê welêt jin nerazîbûnê nîşanî vê biryarê didin. Heta hevjînên siyasetvan û dadgeran jî li ber vê yekê radibin. Di encamê de dadgeh mecbûr dimîne ku biryara xwe bi paş ve bikişîne.
Destûrê didin ku jin bibin doktor, lê bele tenê dikarin bibin jinekolog. Bi berxwedana jinan, gav bi gav deriyên qada tenduristiyê li jinan vedibin.
Agnodice dev ji xeyalên xwe bernade û bi vê berxwedana xwe dibe hêviya jinan.
***Ozgûr Polîtîka***

# Li Ewropa ji ber bûyerên meteorolojîk di 40 salan de 142 hezar kes mirine

**Li gorî raporekê li Ewropayê di nava 40 salên dawî de ji ber bûyerên meteorolojîk 142 hezar kes mirine û bi qasî 510 milyar eûro xisar çêbûye.**

Rapor ji aliyê Ajansa Hawîrdorê ya Ewropayê hate amadekirin. Di raporê de bal kişandin ser xisarên ji ber germa zêde û karesatên wekî lehiyê.
Germahiya zêde di serî de pêla hewaya sar, hişkesalî û şewata daristanan wekî ji sedî 93'ê mirina û ji sedî 22'ê xisarên fînansî hate diyarkirin.
Bi giştî 142 hezar kes mirine û bi qasî 510 milyar eûro xisar çêbûye.
Tirkiye, Kraliyeta Yekgirtî û Swîsre jî di nav de li 32 welatan germahiya zêde bûye sedema mirina 80 hezar kesan.
Ji ber van sedeman li Elmanyayê 42 hezar kes mirine û xisara maddî 107 milyar eûro, li Fransayê 26700 kes mirine û xisara maddî 99 milyar eûro ye û li Îtalyayê jî 21600 kes mirine û xisara maddî jî 90 milyar eûro ye.
Hate diyarkirin bi tenê ji sedî 23'ê mal û milkan sîgorteya wan hebû. Li Romanyayê ev rêje ji sedî 1 e, li Hollandayê ji sedî 55 û li Danîmarkayê jî sîgorteya ji sedî 56'ê mal û milkan hebû.
**ANF**



# Êdî wê dema taksiyên difirin dest pê bike

**Texsiyên difirin ku pir caran di filmên xeyalî yên zanistî de tên dîtin, her ku diçe bala veberhêneran pirtir dikişîne.**

Di sala 2021'ê de, neh milyar dolar ji bo teknolojiya teksiya difire hatin razandin. Li gorî pêşbîniyên kabîneya şêwirmendiya stratejîk ya McKînsey, di nava 10 salan de, taksiyên difirin wê ji balafiran bêtir bifirin. Tê payîn ku taksî di navbera yek û şeş rêwiyan de hilgirin.
Şîrketa Boeîng 450 milyon dolar ji bo taksiyên difirin razandiye. Lêbelê, tenê Şîrketa Emerîkî Boeîng bi vê teknolojiyê re eleqedar nîne.
Gelek şîrketên naskirî, hilberîner an start-up li ser prototîpan dixebitin û di vî warî de firînên ceribandinê dikin. Teknolojiya taksiya difire sozê dide ku wê lezbûyîn, ewlehî, bêdengî û kêmkirina $CO_2$'ê pêk bîne.
Tê hêvîkirin ku ev wesayîtên nû wê bibin alternatîfek ji trafîka li bajarên mezin ya her ku diçe zêdetir dibe.
Lêbelê, pispor difikirin ku ji bo pir kesan, veguhastina rojane wê ti carî ne wisa be. Îhtîmala herî baş ya tê kirin eve ku wesayîtên firînê ji hêla kesên xwedî derfet ve bên bikar anîn.
Ligel ku kapasîteyên daketin û



rabûnê û kêmbûna hejmara rêwiyan pirsgirêkên li pêşiya geşepêdanê ne, rêkûpêkkirina trafîka hewayî, pirsgirêkên jîngehparêzî û jeopolîtîk û metirsiya êrişên sîber ên li dijî van wesayîtan jî ji wan astengiyan têne hesibandin.
***ANF***

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Ast | Pile, rade, derece, sewiye, hîza darax: Dema zimanek nebe zimanê bazarê asta wî dadikeve. |
| Dewre (Erebî) | Beşeke diyarkirî ya zeman: Li saziyê dewreyeke perwerdeyê dest pê kir. |
| Kurs (Fransî) | Perwerdeya ji bo demeke diyar ku ji bo xurtkirina behre, jîrbûn û zanebûnê tê dayîn: Em diçin kursa zaravayê hewramî. |
| Perwerde | Karê fêrkirina kesekî, yan ajelekî. Perwerdeya dibistanan ya îsal baş bû. |
| Pratîk (Fransî) | 1. Tiştên ku bi hêsanî pêk tên. 2. Kesê karekî bi hêsanî û zû çareser dike. 3. Tersê teoriyê: Sozan pir didin lê di pratîkê de pêk naynin. |
| Rêveberî | 1. Karê birêvebirinê. Rêveberiya şaredariyê biryara erzankirina nan da. 2. Saziya birêvebirinê. |
| Rêveber | Kesê di rêveberiyê de ciyê xwe digire, kesên biryar di destê wan de. |
| Rêbaz | Awayê kirina karekî. Reng, şêwe, qeyde, şêwaz. Rêbaza karkirina wî baş e. |
| Wane | Demeke fêrbûn û fêrkirinê. Ders: Xwendekar dibêjin waneyên îsal zor bûn. |
| Zanist | Pisporî, şarezayî, zanyarî, zanîn, nasîn, ilim. Bijîşkî zanisteke pîroz e. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | Î | Z | ■ | A | K | A | M |
| 2 | ■ | A | D | A | N | ■ | E | ■ | Î |
| 3 | A | B | ■ | L | ■ | E | W | K | ■ |
| 4 | C | A | N | ■ | E | Y | ■ | Ê | Ş |
| 5 | ■ | D | O | T | M | A | M | ■ | Ê |
| 6 | J | Î | ■ | Û | ■ | R | A | S | T |
| 7 | I | ■ | A | L | A | ■ | R | A | ■ |
| 8 | ■ | X | W | E | ■ | A | S | Y | A |
| 9 | | ■ | A | ■ | L | A | ■ | Î | Ş |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 3 | ■ | | ■ | | ■ | | | | |
| 4 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 5 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 6 | ■ | | | ■ | | ■ | | | |
| 7 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 8 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 9 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |

### ÇEP-RAST

1. Xeyal
2. Amadebûna hilanîna lengerê keştiyê
3. Ava qirêj ya piştî şûştinê
4. Genimê hêrayî... Cînava şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî
5. Cejin, eyd... Şivika darîn ya zirav ya ku serî tûj e û bi kevan tê avêtin... Eşîr, qebîle, hoz
6. Baneşana kêfxweşiyê... Bi erebî "ez"
7. Firaq... Baneşaneke gazîkirinê
8. Çong... Cihê heranê
9. Rojek... Yezdanekî misrî

### JOR-JÊR

1. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê... Daçekek ku wateyê xurt dike... Kevok
2. Kurteya piştî bûyînê... Notayek
3. Pirsek di rewşa ne tewandî de... (Ehmedê…) Nivîskarê pirtûka 'Mem û Zîn'ê
4. Meydana tenîsleyîstinê... Pirç
5. Tûj... Kurteya ajansa nûçeyan ya Dîcle
6. Xwarina sereke
7. Lixwekirina piyan
8. Mirêk, neynik
9. Zeviya cotkirî ya neçandî... (… Bedirxan) Balerîneke Kurd

# Kiryarên Tirkiyê û hevkariya dewletan domandina komployê ne

Zelal Ceger: Êrişa DAIŞ`ê û çûna Nêçîrvan Barzanî ya Tirkiyê, herwiha bêdengiya koalisyona navneteweyî wek komployeke navneteweyî tê pênasekirin. ***R-4***



Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 940 09-Sibat- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## `Felsefeya Rêbertiyê çareserkirina aloziya Rojhilata Navî ye`

Têkildarî tecrîda giran ya ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, malbatên şehîdan diyar kirin ku, tecrîda ser Rêbertiyê û şerê îro li dijî yekgirtina gelan tê meşandin, ji bo pûçkirina projeya Rêveberiya Xweser û berdewamiya Komploya Navneteweyî ye.***R-5***

# 'JINA AZAD KÎ YE Û DIVÊ ÇAWA BIJÎ?'

## Divê jin ji bo siyaseta demokratîk xebatê bikin

**Divê jin ji bo siyaseta demoqratîk xebatê bikin. Di akademiyên min pêşniyar kirîn de, jin dikarin xwe perwerde bikin. Bi heman rengî li akademiyên din jî bi hezaran kes dikarin bên perwerdekirin. *R-2***



## Wê qehremaniya QSD`ê her tim planên dagîrkeran pûç bike




Endama Kongreya Star Menîca Heyder êrişên dewleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û got, dewleta tirkî bi êrişên xwe nikare îradeya me bişkîne û projeya me ya demokratîk têk bibe. ***R-5***

## 'TEV-DEM bingehê avakirina civakeke demokratîk û ekolojîk e'



Tevî rewşa ku herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tê de derbas dibe, Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM di demeke wisa de, kongreya xwe ya çaran li dar xist û ji êrişan re bû bersiv. ***R-6***

**Birêz Nêçîrvan Barzanî tu li Enqerê çi dikî?**
Dilyar Cizîrî **R-4**



**Tirkiye, dixebite paşroja Sûriyê jî tarî bike**
Zekî Bedran **R-5**

## Cangoriyên jêrzemînên Cizîrê hatin bîranîn

Ji bo 177 kesên dewleta tirkî li Cizîrê di jêrzemînan de bi awayekî hovane kuştîn, çalakiya bîranînê hat lidarxistin. ***R-3***

## Agahiyên `Li Zapê windayiyên gerîla hene` bêbingeh û derew inn



Çapemeniya HPGê çalakiya 9ê Kanûnê ya li qada Cîloyê Piçûk hatî kirin, dimenê wê li ser malpera Gerîla TV parve kir û bi daxuyaniyekê ragihand. ***R-3***

## QSD`ê nasnameyên 7 şehîdan eşkere kirin

QSD`ê nasnameyên 7 şervanên 3`ê ji wan 23`yê Çile di operasyona li dijî çeteyên DAIŞ`ê de li girtîgeha Sînaa ya Hesekê û 4 ji wan jî di êrişa dewleta tirkî ya dagîrker ya ser stasyona elektrîkê ya li gundê Teqil Beqil yê girêdayî bajarê Dêrikê de şehîd bûyîn, eşkere kirin. ***R-3***



## Dijmin jixwe dijmin e!



"Şehîdên me hene. Em di şer de ne. Stratejiya Şerê Şoreşgerî ya Gel stratejiya me ye, riya me ye." ***R-6***

## Panela di wêjeyê de zayendiya civakî hat lidarxistin



Li Amedê panela "Ziman û Jin" û "Felsefeya Mêhrî-Mîtra û di wêjeya kurdî de zayendiya civakî" hat lidarxistin. R-7

## Şêniyên Amûdê şehîdê operasyona `Gurzê Gelan` spartin axê

7'ê Sibatê saet 10:00`an bi hezaran şêniyên bajarê Amûdê bi merasimeke girseyî şehîd Îsa Ebdulah ku di oparasyona `Gurzê Gelan` de şehîd bûbû li Goristana Şehîd Silêman spartin axê. ***R-3***



# Divê jin ji bo siyaseta demokratîk xebatê bikin

Divê jin ji bo siyaseta demokratîk xebatê bikin. Di akademiyên min pêşniyar kirîn de, jin dikarin xwe perwerde bikin. Bi heman rengî li akademiyên din jî bi hezaran kes dikarin bên perwerdekirin.

Xebata akademiyê girîng e. Ji xebata sporê heta siyasetê, ji huqûq heta felsefeyê, heta xebata kargehan, xebata çand hunerê dikarin div an akademiyan de her cure xebata xwe bikin. Ev akademî divê her alî bigire nava xwe. Mînak divê xwendevaneke zanîngehê jî, jinekê malê jî di nava xebatan de cih bigirin. Demekê enstîtuyên gundan hebûn. Dixwestin xebatên bi heman rengî bikin. Lê akademiyên ez pêşniyar dikim, enstituya derbas dike. Nav ne girîng e, akademî, enstîtutî jî dikare bê gotin.

### Jin hilberînêr in

Malbat, li derdora jinê çêdibe. Jin hilberînêr in. Bi yên hildiberînin dikarin pirsgirêkên xwe yên aborî çareser bikin. Nimûne dikarin bi kirêkirina zeviyekê çandiniya organîk bikin. Bi vî awayî di çareserkirina pirsgirêka bêkariyê de wê bibin alîkar. Xebatên jinê heyecanê didin min, jin dikarin ji xwe bawerbin. Ku giraniya xwe bidin ser azadiyê tiştekî ku bi ser nexin tune.

### Ji bo her kesê têkoşîna azadiyê dide rêza bêdawî nîşan dikim

Desthilatdar dixwazin bi jinê, bi pereyan û bi meqam xwe bi hêz bikin. Ji bo min a girîng azadi ye. Her kesê ku têkoşîna azadiyê dide rêza bêdawî nîşan dikim, ev zarokek be jî. Ji bo min bêbandor bihêlin li vir li ser min çewisandina kargêrî, siyasî, adlî bi pêşdixin. Heta ku bixwazin dikarin imha jî bikin. Li vir li ser min pergala dewleta mîkro tê sepandin. Kargêriya girtîgehê heye, ev karên kargêriyê dişopînin. Ji bilî vê tiştek ji destê wan nayê.

Yên li ser min tên sepandin encamên siyasetê ne. Siyaset çi ye? Siyasetê bi du hevoka bi şêwazekî xweşik ji we re bêjim. Siyaset ji herêmî heta gerdûnî, ji kes heta civakê, pirsgirêkên xwe yê nasnamê nîqaşkirin, nasnama xwe azad bi şêwazekî wêjeyî îfade kirin e, anîna zimên e. Siyaseta demoqratîk tiştekî wisa xweşik e. Min ji bo jinan, akademiyên siyaseta demoqratîk û çandê pêşniyar kiribû. Ji bo ciwanan, ji bo yê dîtir min pêşniyar kiri bû. Divê ev hemû gavek berî gavekê bikevin jiyanê. Divê herdem li akademiyan bên gel hev niqaşbikin, tu tiştek çênebe jî wê hişê wan vebe. Siyasetmedar ji van deran derkevin. Perwerda akademiya naşibe perwerda li dibistanên dewletê yên asayî. Bûyera dibêjin civaka eşkere ev e. Pêwîste ligel dewletê jî civak bê demoqratîk kirin. Riya vê jî di her mijarê de têkildarî hemû persgirêkên civakî de rêxistin bûyîn e .

### Em dikarin xwezaya xwe tevê bikin daristan

Rêxistinên ku ez dibêjim kom û komûn wê îfade dike. Wa ye bi pirsgirêka jinê re pêwendîdar, bi hindikahiyan re pêwendîdar hwd. diyardeyek û her bûyerek civakî ku tê aqila re pêwendîdar dibe. Bi şêwazên komin rêxistin çêbibin. Komûnên çandiniyê, komûnên gundan, komûnên taxan hwd. Dikarin bên zêdekirin. Dîsa dibe ku wekî mînaka hêsan bê dîtin, lê mînak komelên parastina darên mazî, zêdekirina wan daran bê kirin. Li her gundî sed darên mazî çandina wan gelekî girîng e û bi sûd e. Em dikarin hemû xwezaya xwe bikin daristan. Hemû rêxistinên sivîl dema dibin sîwana konfederasyona civakî ya sivîl an jî komînalîzma demokratîk bighêje hev wê hêzek mezintirîn a demokrasiyê derkeve holê.

### Divê Kurd civaka demokratîk ava bikin

Divê Kurd bêyî ku desthilatiyê armanc bigrin, civaka demokratîk ava bikin. Pêşniyaza min a ji kurdan re divê rêxstinên demokratîk ên sivîl ên siyasî, civakî, aborî û çandî li her qadê çêbikin, divê van ji dewletê hêvî nekin. Divê em vana bi hêzên xwe yên cewherî bi serbixin. Komalên hawîrdor, komalên hawîrdorparêz û femînîst , rêxistinên kedê, saziyên piştgiriyê û wekî wan bi hezaran komele rêxistin divê bên avakirin. Bi avakirina komeleyên hawîrdorparêz û femînîst, ku bi pêşkevin û bigihên gel kuştinên namûsê û tûrê dikarin bêne asteng kirin. Divê di wê mijarê de civak û jin bên hişyarkirin. Tenê wê demê dikarin azad bibin.

### Di qada siyaseta demokratîk de kêmasiyên ezmûn û perspektîfên ciwana hene. Ji ber vê sedemê, ciwan dema têkoşîn dikin bêsebir tevdigerin.

Ez zanim her kes ketiye rewşeke bûye dîlê kapîtalîzimê û bi taybet di ciwanan de pêşkfti ye. Ji ber vê sedemê ciwan ji bo serkeftinê divê ji pere, pûl û ji derdorên kapîtalîzmê dûr bisekinin. Jiyan ji bo wan wê wisa bi wate be. Saziyên ciwan û jin hêza wan a motor e. Lê divê ku ji ciwan û jinan hinek kes û beş bikarbînin. Divê ciwan û jin li hemberî van şiyar bin. Xwe nedin bikaranîn. Divê mijarê de pir pirtûk û nivîsên min derketin dikarin ji wan sûd bigrin.



### Em di pêvajoyekê de ne ku jiyan bêwate bûye

Min di parêznameya xwe de xwest pirsgirêka jinê bigrim dest. Civak jî weke jinan çawa tê pelçiqandin û mêtingehkirin min xwest vebêjim. Ango di van parêznameyên xwe de min xwest jinkirina civakê dahûrînim, em di pêvajoyekê de ne ku bi taybet di roja me de jiyan bêwate bûye, ji bo bêwatebûyînê derbas bikin, armanc kirina azadiyê girîngiya kilîtkirina azadiyê min xwest vebêjim. Bi taybet ji bo jin ku di nav de ne jiyan bêwate ye, ji bo rewşa di nav de ne derbas bikin, jiyanek bi angaşt bi armanc bigrin pêwîst e xwe kilîtî azadiyê bikin .

Berê min vegotibû ku pirtûka "Jina Azad Kê Ye, Devê Çawa Bijî" pêş bixin hûn dikarin li ser vê xurt bibin. Pirtûka ku min pêşniyar kir wê bi pêşbixin ez vê bi wate dibînim, divê zêde li zilam bawerî nebe. Jin serxwebûna xwe wê bi xwe biparêze, bila parasitina xwe bikin. Pêwîst e ji azadiya jinê neyê tirsîn. Divê jin namûsa xwe bixwe biparêze. Jin wê bibe mirova ku xwe biparêze. Ez bi jinê re wisa rêheval im. Tişta zayenda çors çîrok e. Min bi jinê re rêhevaltiyek balkêş kir, bi jinê re hevaltiyeke min a bi hêz heye. Ev meseleyeke hêz û baweriyê ye. Zilamên wisa hebin ew jî dikarin bibine alîkar. Ez wiha bersiva keda wan a li ser xwe didim. Ez wisa rêzdariya dayîka xwe didim. Pir rêhevalên min ên jin ên ku ji bo min xwe şewitandin çêbûn. Ez wisa bersivê didim bîranînên wan. Jinên bi sîxûrvanî rawestiyan hebûn. Li hemberî yê ku dixwazin min bikarbînin ezê şerê xwe bidomînim, ji bo Fûad`an min pêşniyar kir, çawa baxivin ji bo jinan jî pêşniyazî dikim. Her hefte yek derkeve biaxive bi zimanên cûrbecûr bi erebî, kurdî, farisî divê axaftinên heftane dest pê bikin, bi sepandina min şîroveyên xwe jî tevlî bikin her hefte derkevin baxivin.

***Rêber Apo***

# `Êrişên niha berdewamiya Komploya Navneteweyî ne`

**Dilîn Ehmed-Ronahî**

**Li ser Komploya Navdewleyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan Rozelîn Bekir got, yên felsefeya Rêbertiyê li ser deshilatdariya xwe xeter didîtin, tevlî komployê bûn.**

Komploya Navneteweyî 9`ê Cotmeha 1998`an piştî ku Rêber Abdullah Ocalan ji Sûriyê derket û berê xwe da Yewnanistanê, dest pê kir. Piştî erêkirina dewletên tevlî komployê bûyîn, Rêber Abdullah Ocalan li paytexta Kenya Naîrobî 15`ê Sibata 1999`an radestî artêşa dewleta tirkî hat kirin. Gelê Kurd li seranserê cîhanê, li dijî Komployê, dest bi çalakiyan kir û bi tundî komplo şermezar kir. Ji dema Rêber Abdullah Ocalan radestî desthilata dewleta tirkî hatî kirin ve, tecrîdeke giran li ser tê meşandin. Herwiha bi salan e hevdîtinên parêzer û malbatê jî tên redkirin.

Bi nêzîkbûna salvegera 23`yan ya dîlgirtina Rêber Abdullah Ocalan, endama Meclisa Jinan ya Partiya



Yekîtiya Demokratîk (PYD) Rozelîn Bekir ji rojnameya me re axivî. Rozelîn got, armanc ji komployê qirkirina gelê Kurd bû, lê armanca wan pêk nehat û nayê.

Rozelînê axaftina xwe wiha domand: "Dîsa em derbasî Sibateke nû bûn. Ev heyv bi taybetî 15`ê wê di dîroka gelê Kurd û gelên bi fikir û felsefeya rêber Abdullah Ocalan bawer in, rojeke reş e. Girtina Rêbertiyê kompoyeke Navneteweyî bû ku bi serkêşiya Amerîka hat destpêkirin. Dewleta tirkî bi hezarê salan e tinekirina gelê Kurd ji xwe re kiriye armanc. Bi vê komployê xwestin têkoşin û hebûna Kurdan tine bikin. Lewra projeyên Rêber APO ji bo Rojhilata Navî pêşkêş kirî, li dijî siyseta hêzên desthilatdar e. Ji ber vê yekê ev komplo çêkirin û Rêbertî dîl girtin."

### 'Têkoşîna Îmralî bû çirûskek nû ya azadiyê'

Rozelîn da zanîn ku tiştên niha diqewimin, berdewamiya komployê ne û wiha got: "Destpêkê sala 1990`î deweta tirkî, bi çekên kîmyayî êrişî çiyayên azaad kir. Armanc jê qirkirina tevgera azadiya Kurdistanê bû. Lê bi berxwedana gerîlayên azadiyê û xwîna şehîdan, tevgera azadiyê bihêztir bû. Ji bo wê dewletên ku şerê demokrasiyê dikin, biryara girtina Rêbertiyê dan. Lewra wan ji xwe re digot, 'eger Rêberê Kurdan Abdullah Ocalan were girtin, wê tevgera azadiyê jî tine bibe'. Ne gelê Kurd tenê tevayiya gelên azadîxwez li dijî komployê nerazîbûna xwe nîşan dan. Lewra tevgera azadiya Kurdistanê parastina tevayiya mafê mirovên bindest himbêz dike."

Rozelîn Bekir bal kişand ser têkbirina armanca komployê û got, Rêbertî wek fizîkî hatiye girtin, lewra em li ser fikir û felsefeya wî dijîn û wiha domand: "Berxwedana Rêber APO ya li zindana Îmralî ev mesaj da: 'Hêzên nevneteweyî nikarin bi girtina min fikir û felsefeya min tine bikin'. Têkoşîna Îmralî bû çirûskek nû ya azadiyê, lewra di her hevdîtina bi Serokatiyê re nûbûnek bi xwe re dianî. Ji ber ku dewleta tirkî li hember îradeya Rêbertiyê neçar maye, di van çend salên dawî de, dest bi tecrîda giran kir. Hevdîtina Rêbertiyê bi malbat û parêzeran re, red dike."

### `Bila sala 2022yan bibe sala azadiyê`

Derheqê tecrîda ser Rêber Abdullah Ocalan û êrişên ser Herêmên Parastina Medyayê de jî, Rozelîn diyar kir ku dema dewleta tirkî di êrişên xwe yên ser Herêmên Parastina Medyayê têk diçe, tecrîda ser rêbertiyê girantir dike.

Endama Meclisa Jinan ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Rozelîn Bekir li ser êrişên çeteyên DAIŞ`ê axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di rewşekê de ku bi saya xwîna şehîda û felsefeya Rêbertiyê, aramî li bakur û rojhilatê Sûriyê çêbûbû, dewleta tirkî ya dagîrker, çeteyên DAIŞ bi rêxistin kirin û bi ser bajarê me de şandin. Em dikarin vê bêjin ku avakirina çeteyan berdewamiya Komploya Navnetewey ye. Niha gelê Kurd di qonaxeke nû ya dîrokî re derbas dibe. Ev qonax enceq bi ramanên Rêberê Gela Abdullah Ocalan, bi ser bikeve. Banga min ji gelê Kurdistanê re ew e ku, ji bo azadiya Rêbertiyê têkoşîna xwe xurttir bike û bi berxwedana xwe armancên dijmin têk bibe. Bila sala 2022yan sala azadiya Rêber APO û berxwedêrên di zindanê de be."



# Panela di wêjeyê de zayendiya civakî hat lidarxistin

Li Amedê panela "Ziman û Jin" û "Felsefeya Mêhrî-Mîtra û di wêjeya kurdî de zayendiya civakî" hat lidarxistin.

Komeleya Wêjakarên Kurd, li semta Ofîsê ya Yenîşehîr a Amedê li Payiz Pirtûkê panelek li dar xist. Panel bi moderatoriya Zozan Gulan û bi beşdarbûna nivîskar Xecê Şen û helbestvan Leyla Saraç hat lidarxistin. Şen, li ser "Felsefeya Mêhrî-Mîtra û di wêjeya kurdî de zayendiya civakî" û Saraç jî li ser "Jin û Ziman" axivî."

### Ziman û Jin

Di destpêkê de helbestvan Leyla Saraç axivî. Saraç, anî ziman ku dema ziman diçe dîrok jî, çand jî û nasname jî diçe û got: "Ê ku ziman ava dike jî jin e. Ji ber ya ku zarokan mezin dike jin e, jin civakê ava dike. Civak jî, ziman jî girêdeyî jinê ne. Îro yên ku civakê û ziman pêş dixin jin bi xwe ne. Îro em nikarin ziman û dayikê ji hev du qut bikin."

Saraç, di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser tepisandina jinê jî û got: "Piştî Neolotîkê jin bindest kirin. Xwestin dengê jinê qut bikin. Ji bo jin dengê xwe dernexîne, hişmendiya serdest bendîtiye ava kir."

### Felsefeya Mêhrî-Mîtra

Piştî Leyla Saraç, nivîskar Xecê Şen axavî. Şen, di axaftina xwe de bal kişand ser mijara 'zayendî di hunerê de' û li ser politikayên qirkirin û asîmilasyonê sekinî.

Şen got: "Her çi qas ev politika hebin jî, lê li hember vê yekê kurdan bi her awayî li ber xwe dan."

Şen têkildarî pirtûka xwe ya bi navê "Hûmitra"yê de jî ev tişt gotin: "Mihrî-Mîtra her çi qas ku wek dînekî bê pênasekirin jî di bingeha xwe felsefe ye, huner e."

Şen got: "15 perestgehên Mêhrî-Mîtrayê hene. Ez li van perestgehan geriyam. Lê hin jin wan hê jî ji jinan re qedene e. Ew qedexeya berê niha jî bi heman rengî didome."

Şen, destnîşan kir ku di asasê xwe de wêje, huner di civakê de çibe civak jî bi wî rengî ye.



### Panel bi pirs û bersivan va berdewam kir.

Piştî pirs û bersivan nivîskaran pirtûkên xwe îmze kirin.

Parve bike:

***MA***

# Nexşeyeke rûyan û Hawrê Mecîd

**Li ser tuwalên gelek mezin, di van portreyan de ya ku herî zêde xumamî bûye çav in. Xwediyên çavan weke ku bi çavên vala li mirovan binêrin. Weke ku perdeyek di navbera wan û dinyaya li derveyî wan de hebe û ew jî hewl bidin pişta wê perdeyê bibînin.**

Di hunerê heyî de xêzkirina portreyan, nîşandan rûyan her diçe kêm dibe. Hawrê Mecîd ê ku ji Silêmanî ye û ev 25 sal in li bajarê Elmanyayê Dusseldorfê dimîne, guh nade vê yekê. Ew portreyên hevrê û dostên xwe bi rengê di bîra wî de mane, xêz dike. Di nava wan de hunermend jî gelek in, xasma şêwekar û şair.

Ji ber ku bîr bi demê re xumamî dibe, portreyên wî jî êdî ne portreyên yekser ên mirovan in: Ew bêhtir weke ku xeyalî bin, xuya dikin. Niha ew di pêşangeheke li Dusseldorfê, li avahiya Neuen Kunstraum tên nîşan dan: Li ser tuwalên gelekî mezin. Di van portreyan de ya ku herî zêde xumamî bûye çav in. Xwediyê çavan weke ku bi çavên vala li mirov binihêrin. Weke ku perdeyek di navbera wan û dinyaya li derveyî wan de hebe û ew jî hew bidin pişta wê perdeyê bibînin. Axir di encamê de tesîra portreyan li ser kesekî li wan binihêre wisa ye: hem xeyalî, hem bi rastî, hem jî razdar û zelûl.

Hawrê Mecîd (fermî Haure Madjid) sala 1975´an li Başûrê Kurdistanê, li Silêmaniyê hatiye dinê. Wî li Başûr şêwekarî xwendiye û tesîra realîstiye hişk a şêwekariya Rûs li ser wî heye. Piştî ku sala 1997'an ew bû penaber wî xwe hînî Elmanî kir û sala 1999´an li Akademiya Dusseldorfê hat qebûlkirin. Wî li ber destê profesor Helmut Federle xwend. Ew esas hîna nû li ber destê Federle hîn dibe ku li huner, reng, firçe û tuwalê serwext bibe.

### Rêzeberheman çêdike

Portreyên wî ji bilî tesîra li jor, wiha xuya dikin ku li derveyî demê bin, dikarin mirovên îro, beriya sedsalî û heta beriya 400 salan jî bin. Hinekî wan berhemên şêwekariya resmên welêt ên Rûsî ên salê 1930´î jî tînin bîra mirovan. Lê nexasim jî portreyên jinan hunerê îkonan ên ji dêrên beriya bi sedsalan jî bi bîra mirov dixin.

Ev rêzeberhemeke Hawrê Mecîd e. Ew bi rêzeberheman dixebite. Rêzeberhemên wî yên peyzajan jî hene. Ew wekî din xemlan jî çêdike û wî kitêbek li ser nebat, dever û dermanên gelêrî jî nivîsandiye. Di ser bernameyeke eyaleta NRW´ê wî li dibistanên amadehiyê dersa Huner jî da.



### Niha tenê şêwekar e

Ew niha tenê şêwekar e. Beriya ku bi rengan xwe berda meydana tuwalên xwe, ew ser tuwalên xwe xweşik bi zemqaspî, gêç û çingoyê rast dike û hîna nû rengên zeytî li wan dixe. Lê ew weke ku rengên avî bi kar bîne, ziravik kar dike, ew pêşî li bendê dimîne ku tebeqeyên zirav heryekî ji wan zuwa bibe, beriya ku dest bi tebeqeyeke din bike. Encam jî ew perdeya li ser çavan, ew xumamîbûna di navbera rastî û xeyalê de ye.

### Navneteweyî nû hat nasîn

Wî hîna nû xelata Villa-Romana wergirt û berê xwe da Florenzê, ew ê li wir deh mehan bimîne. Axir pêşangeha wî heta 20´ê Sibatê li Dusseldorfê wê vekirî be. Kesên hez dikin, dikarin her pêncşem û în saet ji 15´an heta 20´an û her şemî û yekşem saet ji 14´an heta 18´an biçin serdana pêşangehê. Pêşangeh bê pere ye.

***Ozgûr Polîtîka***

# PEN bifikar in

**Gelek Navendên PEN'ê li dijî binpêkirin, êriş û astengiyên dewleta tirkî bi daxuyaniyên xwe nerazîbûn nîşan dan û gotin, em ji binpêkirinên li Tirkiyê .**

Li gorî agahiyên PENa Kurdî li ser malpera xwe parve kiriye, Caroline Stockford a ku hem di PENa Norwecê de 'Şêwirmenda Maseya Tirkiyê' ye, hem jî 'Endama PENa Gallerê' ye, di hesabê xwe yê tora civakî de bi daxuyaniyekê got, ew derbarê demokrasî, mafên mirovan û azadiya derbirînê ya li Tirkiyê de bifikar in.

Caroline Stockfordê bal bire ser veguhestina Wezîrê Edaletê û got, Bekîr Bozdag, wezîrê nû, xwediyê rabirdûyeke ne baş e, di dema kuştina Tahîr Elçî yê parêzerê mafên mirovan û Serokê Baroya Amedê de, dîsa wezîr bûye, tevî ku soza peydakirina kujeran daye malbata Elçî jî, heta niha derbarê meseleyê de tiştek nehatiye kirin. Hêjayî gotinê ye ku Bekîr Bozdag, di serdema wezîrtiya xwe ya berê de, derbarê tacîza zarokekê de, gotibû, di meseleya tacîzê de "rizaya' zarok jî hebûye" û ev daxuyaniya wî di nav raya giştî de bûbû sedema nerazîbûnê.

Caroline Stockfordê her wiha bal bire ser biryarnameyên Serokomariyê û got, "Di van biryarnameyan de bi awayekî eşkere pîlaneke zextan û çewisandinê heye". Li gorî Şêwirmenda Tirkiyê ya PENa Norwecê, di demên dawî de 6 malperên demokrat û sosyalîst hatine girtin û ev biryarname wê di rojên pêş de rê li ber girtina bernameyên televizyonê û malperên din jî veke.

Caroline Stockfordê da zanîn ku ew ê rewşa dawî ya li Tirkiyê bixin rojeva civîna xwe û wekî PENa Norwecê li ser rewşa heyî daxuyaniyeke nivîskî belav bikin. PEN'a Norwecê piştî nameya endama xwe, daxuyaniyeke nivîskî belav kir û tê de heman rexneyên li jor û fikarên xwe parve kirin.

### 185 dezgehên çapemeniyê hatine girtin

Gelek navendên PEN'ê yên dinyayê bi îmzeya xwe piştgirî dan daxuyaniya PENa Norwêcê. PENa Navneteweyî, PENa Kurd, PENa Tirkiyê, PENa Holanda, PENa San Miguel, PENa Danîmarka, PENa Elmanya, PENa Romanya, PENa Emerîka, PENa Swêdê, PENa Esperanto, PENa Vietnamê (ya li derve), PENa Melbournê û PENa Xirwatistanê ev daxuyaniya PENa Norwêcê



îmze kirine. Wan ji rêveberî û hikûmeta Tirkiyê xwest ku binpêkirinên maf û azadiyan dewam neke, rêzê ji azadiya çapemenî û medyayê re nîşan bide û rê li ber mafê xweîfadekirinê bê vekirin. Daxuyanî bi bîr dixe ku Biryarnameyên Serokomariyê destê Lijneya Bilind a Radyo û Televizyonan (RTUK) xurt dike û heta niha bi biryarnameyan 185 sazî û dezgehên medya û çapemeniyê hatine girtin û ew guman dikin ku rewşa heyî xerabtir bibe. Navendên PEN'ê yên ku bi îmzeyên xwe destek dan daxuyaniyê, dan zanîn ku ew ê wekî berê, ji niha û pê ve jî rewşa binpêkirinên li Tirkiyê ji nêz ve bişopînin.

***Ozgûr Polîtîka***

## Dijmin jixwe dijmin e!

**Emer Ereb**



“Şehîdên me hene. Em di şer de ne. Stratejiya Şerê Şoreşgerî ya Gel stratejiya me ye, riya me ye.”

“Şehîdên me hene. Em di şer de ne. Stratejiya Şerê Şoreşgerî ya Gel stratejiya me ye, riya me ye.”Ev hevok di demên dawî de hevokên gelên bindest, gelê Kurd, gelê Ereb, gelê Suryan, bi kurtî hemû endamên Konfederalîzma Demokratîk in. Bi dengekî xurt, bi dengekî ku cîhan bibihîze ji Kurdistanê, ji Rojhilata Navî li seranserê dinyayê belav bûne.

Şehîdên me hene. Belê, em rojane şehîdan didin. Li dijî paşverûtiya dinyayê, li dijî zilmê, zextê, bindestiyê, qirkeriyê, xiyanetê em şehîdan didin. Em bi şehîdên xwe serbilind in. Şehîdên me ji bo parastina hemû nirxên mirovahiyê, însaniyetê, ji bo parastina rûmeta mirovahiyê canê xwe kirin sîper û hemû dinya careke din ji belayeke mezin xelas kirin. Di bin navê DAIŞ’ê de, di bin navê dewleta Tirkan de, di binê navê PDK’ê de, di binê navê şaxên van ên cuda de rojane êrîş li ser me hene. Em şehîdan didin. Şehîdên me li hemberî van disekinin û hemû dinyayê diparêzin. Di vir de wek kevneşopiya Tevgera Azadiyê hin pirs derdikevin; emê tola şehîdên xwe çawa rakin? Emê bîranînên şehîdên xwe çawa bidin jiyandin? Emê xewn û xeyalên şehîdên xwe çawa pêk bînin? Şehîdên me çima şehîd bûn û ji bo meşandina doza van şehîdên xwe lazim e em çi bikin?

Em di nav şer de ne

Têkildarî dijminên gelan, Kurdan, Ereban, gelên din ên bindest gelek analîz dikarin pêş bikevin. Nav dikarin bên dayîn, têkiliyên wan dikarin bên vekirin, peymanên bi wan re hatine kirin dikarin bên ravekirin, di nava rewşa siyasî-eskerî ya cîhanê de rewşa wan dikare bê bidestgirtin û hwd. Lê, tiştekî esas heye, dijmin dijmin e. Dijminahiya xwe dike. Dijmin ne tenê yek-du piyonên wekî dewleta Tirkan, DAIŞ, PDK ne, dijmin bi giştî sîstemek e, sîstema modernîteya kapîtalîst e, artêşa wê NATO ye. Heger ev nebûya her hal dewleta Tirkan wê nikarîbûya di heman demê de bi balafiran êrîşî xaka du weletan bike, rojane êrîşên xwe bidomîne. Di vê babetê de wekî çarçoveya giştî heger ku dijminekî me yê wisa heye û em rojane şehîdan didin, wê çaxê lazim e li dijî vê yekûnê têkoşîneke me ya topyekûn jî hebe. Ew jî bi pênaseya Şerê Gelê Şoreşgerî di sloganan de hatiye îfadekirin. Şehîdên me rêya Şerê Şoreşgerî ya Gel nîşanî me dane. Rêya wê heta dawiyê vekirine. Dijminên me û dijminê me yê esasî nîşanî me dane. Di vê rêkê de wekî şopdarê/a rêya şehîdan, tişta dikeve ser milê me wekî soza me daye şehîdan, wekî di van merasîmên mezin de me wekî dirûşm berz kirine, şopandina rêya şehîdan e. Naskirina dijminê xwe ye, rakirina çeka şehîd e û hilanîna tola şehîd e. Ruhê şehîd wê wisa şad bibe. Dema ku ew çeka şehîd li erdê nema, dema ku li şûna yekî/ê deh bi cih bûn, wê çaxê dê Şerê Gelê Şoreşgerî bigihêje armanca xwe, wê çavê dijminan bitirse, dê nikaribin bi rehetî li baregehên xwe rûnên, dê nikaribin li ser cadeyan bi rehetî bigerin, wê wextê dê êrîşên hovane bisekinin, wê statu jî çêbibe wê serxwebûn jî çêbibe, wê tola şehîdan jî bê hilanîn, şopdariya şehîd jî wê pêk were û xeyalên şehîdan jî wê bên bicihanîn.



Em di nav şer de ne. Di nav şer de wê êrîş li ser me çêbin û ji çar aliyan ve jî wê dorpêç li ser me hebin. Dê ji nava me xayîn jî derkevin û şerê taybet jî wê bê meşandin. Wê hewl bidin di nav me de fesadî, xerabî, gotegotan jî belav bikin. Wê hewl bidin bi ambargoyên fîzîkî, siyasî, aborî, heta bi hewldanên lîncên fîzîkî, siyasî, aborî êrîşî me bikin. Em di nava şer de ne. Serkêşiya şer Gladioya NATO’yê dike. Şerê li dijî me şerekî wisa ye. Di vê rewşê de çi dikeve ser milê me? Di şer de gel çi dikin? Di şer de însan çawa dijîn? Di şer de însan çi amadekariyan dikin? Di şer de însan çawa tevdigerin, xwe çawa rêxistin dikin? Ketina nav şer çi ye?

Îro em ji nêz ve dibin şahidê van hemûyan. Îro ji bo vegotina van, îzaha van pêwîstî bi gotineke pir zêde tine ye. Stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî, şopandina rêya şehîdan, dijminê hemû gelên bindest, paşverûtiya cîhanê rojane li ber çavê me ye.

Pirsa esas dîsa ev e; dijmin dijmin e, dijmin dijminahiya xwe dike, lê em çi dikin, em ê çi bikin?

Di roja me de her çiqasî li beramberî van pirsan bersiveke têgihiştî, hişmendiyek, tevlîbûnek, rêxistinbûnek ava bibe jî dîsa wekî ku di êrîşên dijmin de jî xuya dibe ne di wê astê de ye ku çavê dijmin bitirsîne, dijmin bişkîne.

Çiqasî hêza me hebe jî, em di warê înşayê de mezin bibin jî heger ku dijmin hêna bi vî şeklî êrîş dike naxwe hêna di hin waran de me lawaz dibîne. Wê çaxê bi qasî tespîta dijmin, analîza dijmin, lazim e em karibin li xwe jî vegerin û valatiya ku derfeta vê êrîşê dide qepat bikin.

Em bizanin, dema ku me wekî gel got, “em yek in”, wê çaxê ne êrîşên wisa bizdonek, namerdane, hemû cîhan jî dema ku wê êrîşek bi ser me de were dê bi hezaran, bi milyonan caran bifikire. Wê ne bi me bifikire, wê esas dîsa bi xwe bifikire. Yekane rêya serketinê jî, rêxistinbûna gel e, yekîtiya gel e, Şerê Gelê Şoreşgerî ye.

Serkeftin di rêya şehîdan de ye!

# ‘TEV-DEM bingehê avakirina civakeke demokratîk û ekolojîk e’

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Tevî rewşa ku herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tê de derbas dibe, Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM di demeke wisa de, kongreya xwe ya çaran li dar xist û ji êrişan re bû bersiv.**






Tevgera Civaka Demoktratî TEV-DEM di 2011`an de, da ku civaka Sûriyê ji aliyê hin hêzan ve neyê parçekirin, herwiha ji bo ku kombûnekê di navbera tevayiya pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê de çêke hat avakirin.

2006`an Komeleya Civaka Kurd li Rojavayê Kurdistanê li ser esasê azadiya Kurdistanê û demokrasiya Sûriyê hate avakirin. Lê di 2011`an de di kongreya yekê ya tevgera Civaka Demokratîk nav hat guhartin û bû Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM).

Derbarê armanca xwebatên Tevgerê, hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso da zanîn ku TEV-DEM tevgereke civakî ye û bi armanca avakirina civakeke exlaqî, polîtîk û ekolojîk dixebite û axaftina xwe wiha domand: “Em li ser bingeha sîstema wekheviya civakî, jiyana hevbeş, rêzdayîna ji pirrengiya çandî û parastina mafên tevayiya pêkhateyên civakê, kar û xebatê dikin. Di destpêka damezirandina tevgerê de me dest bi rêxistina civakê kir, da ku çand û nirxên demokratîk belav bibin û çanda xweparastinê bi cih bibe. Jixwe armanca tevgerê ew bû ku rola xwe ya aktîf û bandor di rêxistina civakê de bilîze. Ji bo wê jî Piraniya xebata tevgerê bi armanca rêxistinkirina komîn, meclisên bajar û herêmên Rojava bû. Herwiha me girîngî da berfirehkirina asta têkoşînê li Bakur û rojhilatê Sûriyê.”

### Lidarxistina Kongreya çaran ya Tevgerê

Kongreya TEV-DEM’ê ya çaran di 5’ê Sibata 2022’yan li Navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran li Rimêlan bi dirûşma “Çanda demokratîk bi saziyên demokratîk bi pêş dikeve” de bi beşdarbûna 400 kesan, hate lidarxistin. Di kongrê de nûnerên ji tevahî rêxistinên siyasî, civakî, çandî, rûspiyên eşîrên Kurd, Ereb û Suryan amade bûn.

Derbarê mijarê de Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso ji rojnameya me re axivî û got, em her sê salan carek kongreya xwe li dar dixin. Me di 3`yê Tîrmeha 2011`an de li Rojavayê Kurdistanê kongreya xwe ya yekê li dar xist. Wê demê me Kongre li herêma Girkê bi beşdariya bi sedan welatparêz, jin, ciwan, rûspî û rewşenbîran li dar xist. piştî wê di 2014`an de me kongireya duduyan li dar xist, ya sisiyan jî 2018’an hat li darhistin. Niha jî me di 5 vê mehê de kongreya xwe ya çaran li dar xist. Herwiha gelek nîqaşên ji bo pêşxistina civak û çareserkirina aloziya Sûriyê hatin kirin û gelek encam û biryarên ji bo dema pêş hatin diyarkirin.

**Encamên kongrê wiha ne:**

-Mafên jin û ciwanan were misogerkirin; piştevaniya plan û projeyên taybet bi wan re were kirin.

-Azadiya giştî û mafên rêxistinên civaka sivîl werin geşkirin û parastin.

-Çanda demokratîk bi rêya bernameyên perwerdeyê di Akademiyên Civaka Demokratîk de were pêşxistin.

Civak di çarçoveya Saziyên Civaka Sivîl de were zanekirin û rola wê bikeve xizmeta berjewendiya giştî û edaleta civakî di avakirina yekitiya neteweyî de pêk were.

-Rihê hevkarî û çareserkirina nakokiyan bi rêyên dilxwazî werin geşkirin.

-Rêxistinên civaka sivîl di berhemdayîn û xizmetguzariyên civakî de werin çalakkirin.

-Têkiliya biratî, hevkarî û yekitiya di navbera rêxistinên civaka sivîl de li ser asta Sûriyê were xurtkirin.

-Piştevaniya mafên gelan di çarenûsa wan de were kirin.

-Têkoşîna ji bo vegera koçber û penaberan li bakur û rojhilatê Sûriyê were kirin.

-Têkoşîna ji bo tinekirina teror, bidawîkirina dagirkerî û terorê li herêmên dagirkirî were kirin.

-têkoşîn ji bo derxistina PKKê ji lîsteya Terorê were kirin.

Xerîb Hiso da zanin ku di kongreyê de pêşinyara hejmara endamên meclisê zêde bibe, hebû û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Pêwîstî hebû ku jimara kesên di meclisa tevgerê de were zêdekirin. Da ku em di vê salê xwe bigihînin beşeke mezin ji pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Ji ber wê jî di encamê de hejamra meclisê Ji 64 endaman bû 80. Yên kordînasyonê jî ji 18 endaman bûn 30. Hrwiha wek hevserok jî li şûna Zelal Ceger, Roken Ehmed hat hilbijartin.

Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso di dawiya axaftina xwe de got, civaka me pêwîstiya wê bi rêxistinê heye. Çimkî 11 sal in em di nava aloziyejkê de dijîn. Ji bo wê jî emê hewl bidin ku perwerdeyên nava civakê zêde bikin û xwe bighînin tevayiya pêkhateyan.



# Şêniyên Amûdê şehîdê operasyona `Gurzê Gelan` spartin axê

7’ê Sibatê saet 10:00`an bi hezaran şêniyên bajarê Amûdê bi merasimeke girseyî şehîd Îsa Ebdulah ku di oparasyona `Gurzê Gelan` de şehîd bûbû li Goristana Şehîd Silêman spartin axê.

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**



Merasimê bi deqeyeke rêzgirtinê li ser giyanê şehîdan dest pê kir. Pişt re li ser navê Meclisa Malbatê Şehîdan Seîd Ferso, axivî û êrişên çeteyên DAIŞ`ê herwiha kiryarên dewleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û wiha got: “Em sersaxiyê ji tevayiya malbatên şehêdan re dixwazin. Hebûna me bi saya xwîna şehîdan e. Ji bo wê divê em li keda wan xwedî derkevin û hêviyên wan yên azadiyê pêk bînin.”

Herwiha bi navê Kongreya Star Remziya Mihemed sersaxî ji malbatên şehîdan re xwest û got, van pakrewanan li dijî çeteyên hov li ber xwe da û şer kirin heta ku gihîştin asta şehadetê. Êrişên çeteyên DAIŞ`ê li ser zindana Sînaa ya Hesekê ne tiştekî piçûk û hindik bû. Çeteyan dixwest bi vê êrişê nasnameya me tine bikin û destkeftiyên heyî têk bibin. Rast e dewleta Tirkan ya dagîrker bi plan êrişan dike, lê ti caran palanên wê bi ser nakevin.

Remziya Mihemed di dawiya axaftina xwede got, em tola şehîdan li erdê nahêlin emê bi rihê têkoşîna şehîdên xwe planên dewleta tirkî têk bibin.

Herwiha Hevserokê Meclisa Leşkerî ya bajarê Amûdê Berxwedan Amûdê diyar kir ku çeteyên DAIŞ`ê ev êriş ne bi tena serê xwe kirin, lê belê bi alîkariya hevalbendên xwe kirin û got, me azadî ne bi hêsanî bi dest xistiye, ji ber wê em ti carî dev ji azadiya xwe bernadin. Divê em ji berdêlên didin netirsin, gelê Rojava ketiye ser rêya azadiyê û ti kes nikare wî ji rêya azadiyê paş de vegerîne.



Pişt re bi sloganên `şehîd namirin, tola we li erdî namine û biji Rêber Apo` şehîd spartin axê û meresim bi dawî bû.

# Agahiyên `Li Zapê windayiyên gerîla hene` bêbingeh û derew inn

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Çapemeniya HPGê çalekiya 9ê Kanunê ya li qada Cîloyê Piçûk hatî kirin, dimenê wê li ser malpera Gerîla TV parve kir û bi daxuyaniyekê ragihand.**

Daxuyanî wiha ye:

“9’ê Kanûnê tîmên me yên gerîla yên mobîl avêtin ser 2 kozikên dagîrkeran ên li rêzeçiyayên Cîloyê Piçûk. Hêzên me dema ku ketin nav kozikên dijmin, leşkerên artêşa Tirkiyê ya dagîrker ku bi çalakiyên karîger ên gerîla ên li ser herêma Zapê derbên giran xwarin, kozikên xwe berdane û li eraziyê tertûbelav bûne. Hêzên me nehiştine ku dagîrker hilmê bistînin, cihê komeke hêzên dagîrker ya li eraziyê tespîtkirine û li qada çalakiyê planeke nû ya çalakiyê danîne. Bi çarçoweya vê planê saet 11:40’î ji du baskan ve dagrîker bûne hedef û gerîlayan bi ser wan de girtin. Baskê pêşî ji nêzîk bi çekên şexsî li kon dane ku dagîrker tê de bûn. Li vir bi kêmanî 3 dagîrker hatine cezakirin. Baskê duduya jî bi taktîka suîkastê li dagîrkeran daye û 2 dagîrker hatine cezakirin. Dagîrkerên din qutifî ne û tertûbelav bûne. Tîmên me yên gerîla yên mobîl ên profesyonel bêyî ku ziyan were ser wan ev çalakî temam kirine. Nûçeyên medyaya şerê taybet ya Tirkiyê ku dibeje li Zapê windahiyên gerîla hene bêbingeh û derew in. Di encama vê çalakiya serketî de ku taktîkên gerîlaya serdema nû di zik hev de hatine bikaranîn û çalakiya koordîne de herî kêm 5 dagîrker hatine cezakirin.”



# Cangoriyên jêrzemînên Cizîrê hatin bîranîn

**Ji bo 177 kesên dewleta tirkî li Cizîrê di jêrzemînan de bi awayekî hovane kuştîn, çalakiya bîranînê hat lidarxistin.**

Li navçeya Cizîrê ya Şirnexê 14’ê Kanûna 2015’an ‘qedexeya derketina derve’ hatibû ragihandin. Di wê demê de li Taxa Cûdî di jêrzemînên sê avayiyan de 177 kes asê mabûn. Ev 177 kes hatibûn şewitandin. Ji bo cangoriyên di jêrzemînan de hatîn kuştin, çalakiya bîranînê hat lidarxistin.

Bîranîn li avayiya rêxistina HDP’ê ya Cizîrê hat lidarxistin. Malbatên cangoriyan, çalakvanên TJA’yê, parlementerên HDP’ê yên Şirnexê Nûran Îmir, Huseyîn Kaçmaz û Hasan Ozguneş, Hevşaredarên Silopya Adalet Fîdan û Suleyman Şavlûk jî di nav de gelek kes tevlî bîranînê bûn.

Li eywanê navê cangoriyên hatîn şehîdkirin û pankarta ‘Lehengên Cizîra Botan’ hat daliqandin.



Hevseroka HDP’ê şaxê Cizîrê Zîlan Ecevît di bîranînê de axivî û got, li ber çavê dinyayê bi sedan mirovên me hatin şehîdkirin. Emê ti carî vî tiştî ji bîr nekin û nedin jibîrkirin. Çawa ku wan mirovên me gotin ‘Çi dibe bila bibe, emê çok daneynin erdê’ em jî sozê didin wan ku emê jî çok daneynin erdê.”

Parlementerê HDP’ê Hasan Ozguneş jî diyar kir heta kesên azadîxwaz hebin wê têkoşîna kesên li ser rêyê jiyana xwe ji dest dane jî bidome.

Piştî axaftinan ji bo kesên di jêrzemînan de hatîn şehîdkirin, sînevîzyonek hat nîşandan.

Bîranîn piştî dayîna mewlûdê bi dawî bû.

***ANF/Şirnex***

# QSD`ê nasnameyên 7 şehîdan eşkere kirin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**QSD`ê nasnameyên 7 şervanên 3`ê ji wan 23`ê Çile di operasyona li dijî çeteyên DAIŞ`ê de li girtîgeha Sînaa ya Hesekê û 4 ji wan jî di êrişa dewleta tirkî ya dagîrker ya ser stasyona elektrîkê ya li gundê Tiqil Beqil yê girêdayî bajarê Dêrikê de şehîd bûyîn, eşkere kirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) li ser malpera xwe ya fermî navên 7 şehîdan ragihandin. Herwiha di daxuyaniyê de soza pêkanîna armancên şehîdan hat dayîn.

Daxuyanî wiha ye:

“Em bi rêzdarî 7 rêhevalên xwe ku di Pêngava ‘Gurzê Gelan’ de û li Dêrikê şehîd bûne, bîr tînin.

Di çarçoveya Pêngava ‘Gurzê Gelan’ li dijî êrişên çeteyên rêxistina terorîst ya DAIŞ`ê li ser girtîgeha Hesekê de ku rêhevalê me Îsa, Medenî û Xidir di 23’yê Çileyê de bi lehengî şer kirin gihaştin asta şehadetê.

Di nava plana berfireh ya çeteyên rêxistina terorîst ya DAIŞ`ê de li ser girtîgehê û bi destekdayîna ji dewleta Tirkiyê, êriş bi rihê fedayî yê şervanên me û gelê herêmê, têk çû Piştî têkbirina êrişa li ser girtîgeha Sinaa, dewleta Tirkiyê serkeftina li dijî çeteyên DAIŞ`ê li Hesekê tehemûl nekir. Di 1`ê Sibatê de bi balafirên şer stasyona kehrebeyê ya li nêzî gundê Teqil Beqil yê Dêrikê bombebaran kir û di encama wê de rêhevalê me Mihyedîn, Xebat, Siyabend û Şiyar şehîd bûn.

Rêheval Xemgîn, Şiyar, Medenî û Siyabend li dijî dagîrkeran tê koşiyan û ji destpêk tevlêbûna li nava şoreşa bakur û rojhilatê Sûriyê ve qehremaniyek mezin meşandin. Têkoşîna xwe bi heman rihî li dijî çeteyan berdewam kir. Xwedî helwestên xurt û layîqê şoreşê bûn û ji ber wê jî tê koşiyan û gihaştin asta şehadetê.

Her rêhevalekî me ji welat û gelê xwe hez dikir û xewn û xeyalên wan tenê girêdayî serketinê bûn. Her çar û bi baweriyeke kûr û girêdaneke xurt bi nirxên azadiyê ve ku her kêlî di jiyana xwe de pêk anîn. Ji roja yekemîn ya destpêkirina gera azadiyê û heta gihaştin asta şehadetê ji bo gel û welatê xwe gav paşde neavêtin. Ev jî bi girêdana wan bi nirxên gel û şoreşê ve, diyar bû. Di rewşên zehmet de nûnertiya nirxên şehîdan, gel û rêveberiyê kir û bûn beşek ji jiyana wan ay rojane.

Rêhevalên me Îsa, Xidir û Mihyedîn zarokên vî gelî û vê axê ne. Bi hezkirin erkên xwe di nava Şoreşa Rojava de pêk anî û li dijî hemû cûreyên dagîrkeriyê, tê koşiyan. Di şexsê her 7 rêhevalên xwe de em hemû şehîdan bi rêzdarî bi bîr tînin. Em sersaxiyê ji malbatên şehîdan û gelê xwe re dixwazin. Bîranîna wan hêza me di têkoşîna li dijî dagîrkeran, de zêdetir dike. Careke din em soza xwe bi şehîd, gel û rêveberiya xwe re nû dikin ku em ê têkoşîna ji bo azadiyê berdewam bikin heta ku em serkeftinê bi dest bixin.

Nasnameyên şehîdan wiha ne:



Navê Tevgerî: Mihyedîn
Nav û paşnav: Mihemed Mihemed
Navê dayikê: Emîne
Navê bav: Hesen
Cihê ji dayikbûnê: Dêrik
Cih û dîroka şehadetê: Dêrik 1`ê Sibat – 2022`an

Navê Tevgerî: Siyabend Bêkes
Nav û paşnav: Ebdurehman Şêxo
Navê dayikê: Yasmîn
Navê bav: Mûsa
Cihê ji dayikbûnê: Efrîn
Cih û dîroka şehadetê: Dêrik 1`ê Sibat – 2022`an

Navê Tevgerî: Şiyar Kobanê
Nav û paşnav: Mihemed Îsmaîl
Navê dayikê: Ferîde
Navê bav: Ehmed
Cihê ji dayikbûnê: Kobanê
Cih û dîroka şehadetê: Dêrik 1`ê Sibat – 2022`an

Navê Tevgerî: Xemgîn Bilbil
Nav û paşnav: Mihemed Hesen
Navê dayikê: Zelûx
Navê bav: Hesen
Cihê ji dayikbûnê: Efrîn
Cih û dîroka şehadetê: Dêrik 1`ê Sibat – 2022`an

Navê Tevgerî: Îsa
Nav û paşnav: Îsa Abdullah
Navê dayikê: Emîne
Navê bav: Ehmed
Cihê ji dayikbûnê: Amûdê
Cih û dîroka şehadetê: Dêrik 1`ê Sibat – 2022`an

Navê Tevgerî: Medenî Norşîn
Nav û paşnav: Medenî Bozkurt
Navê dayikê: Nûriye
Navê bav: Rîda
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê – 23`ê Çile – 2022`an

Navê Tevgerî: Xidir
Nav û paşnav: Xidir El-Salih
Navê dayikê: Emşe
Navê bav: Hisên
Cihê ji dayikbûnê: Hisên
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê – 23`ê Çile – 2022`an

# Kiryarên Tirkiyê û hevkariya dewletan domandina komployê ne

Zelal Ceger: Êrişa DAIŞ`ê û çûna Nêçîrvan Barzanî ya Tirkiyê, herwiha bêdengiya koalisyona navneteweyî wek komployeke navneteweyî tê pênasekirin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Ji Komploya Navneteweyî heta niha, komployên dewleta tirkî bi armanca qirkirina gelê Kurd di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de berdewam in. Niha jî bi êrişên qirkirina gelê Kurd komploya navneteweyî dewam dike. Herî dawî dewleta tirkî ya dagîrker bi piştgiriya 'dewletên qaşo li dijî DAIŞ'ê di herêmê de hêzên xwe bi cih kirine', xwest careke din DAIŞ'ê li bakur û rojhilatê Sûriyê zindî bike. Lê ji ber ku plana wê bi ser neket, nerazîbûna xwe nîşan da û êrişeke bi giştî pêk anî. Li kêleka van êrişan dewletên têkildar bêdeng man. Ne dewletên koalisyonê tenê, hikûmeta başûr jî hevkariya xwe ya bi Tirkiyê re didomîne.

Derbarê Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibata 1999'an û girêdana vê komployê, bi kiryarên heya niha li dijî gelê Kurd û yê herêmê Zelal Cerger bi me re axivî.

Zelal Ceger da zanîn ku her sal dewleta tirkî ya dagîrker di dema komployê de êrişên xwe nû dike û axaftina xwe wiha domand: "Komploya Navneteweyî ya 1999`an di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de, li ser tevayiya gelê azadîxwaz hat kirin. 23`ê sal di ser vê komloyê re derbas dibin; heta niha jî Tirkiyê û hevkarên xwe qirkirina li ser gelê Kurd didomînin. Tirkiye Her sal di dema komloyê de êrişên xwe nû dike. Herwiha dixwaze bi riya Cebhert El-Nusra û DAIŞ'ê, gelê kurd û tevayiya Pêkhateyan ku li ser vê xakê dijîn bixe xeteriyekê bê veger. Herî dawî jî wek ku hat dîtin bûyera di 20`ê Çile'yê de li Hesekê çêbû, weke Kompoyek Navnetewî tê pênasekirin. Diwazin bi van bûyeran, fikrê Netewa Demokratîk tine bikin û azadiya gelan ya ku bi saya rêbertî hatiye pêşxistin têk bibin."



## `Binketina DAIŞ'ê binketina dewleta tirkî ye`

Ceger da xuyakirin ku piştî binketina DAIŞê ya li Hesekê Tirkiyê wek tolrakirinê êrişeke bi giştî pêk anî û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Êrişa ku ji aliyê çeteyên DAIŞê ve li ser girtîgeha Sînaa ya li Hesekê, bi serkêşiya Tirkiyê û erêkirina dewletên koalisyona li dijî DAIŞ'ê hat kirin. Nêzî 5 hezar DAIŞ'î di girtîgehên bakur û rojhilatê Sûriyê de hene. Di heman demê de li Kampa Holê bi hezaran jin û zarokên DAIŞê hene. Her kes dizane ku ev kamp û girtîgeh, ji bo cîhanê giştî weke bombeyekê ye, eger biteqe wê xeteriyekê mezin li Rojava giştî cîhanê çê bike. Lê qehremanên azadiyê, şervanên QSD, YPG, YPJ Asayîş û hêza gelê berxwedêr, palanên çeteyan vala derxistin û çareke din serkeftin misoger kir in. Ev serkeftin li xweşiya Tirkiyê nehat, çimkî binketina DAIŞ'ê binketina Tirkiyê ye. Ji bo wê jî nerazîbûna xwe li hember vê serkeftinê nêşan da û di roja duduyan de êrişeke bi giştî li ser herêmên me pêk anî. Rojava, Şingal û Mexmûr hedef girt û balafirên xwe yên şer rakirin."

## Hevdîtina Nêçîrvan û Erdogan

Zelal Ceger teqez kir ku hevdîtina li gel dijminê Kurdan tê wateya bêrêzî û dijminahiya gelê Kurd û tevahî gelê azadixwaz û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di roja ku dagêrkeriya Tirkî êrişa bi giştî pêk anî, Nîçîrvan Barzanî li Tirkiyê bû. Wê demê gelê Rojava digot, 'hê me şehîdên xwe nespartîn axê, gelo Nêçîrvan li Enqerê çi dike!' Bêguman ev hevdîtin rastiya hevkariya Nîçîrvan bi Erdogan re dide xuyakirin. Ev ji bo mala Barzanî rûreşiyeke. Wek Berpirsê kurdan gereke ji Erdogan re gotiba, 'tu kurdan dide kuştin ez nayêm gel te', lê tersî wê kir û jê re got, 'ez amade me ku bi te re hevdîtin bikim'. Ev hevdîtin ji bo xurtkirin û nûkirina hevkariyê bû."

## `Tirkiyê ji bêdengiya Rûsya û Emerîka cesaretê digire`

Zelal Ceger teqez kir ku Rûsya û Amerîka berjewendiyên xwe li Rojava esas digrin û wiha got: "Ji 2014`an heta roja îro gelê kurd li hember DAIŞ'ê şer dike. Rûsya û Amerîka jî qaşo li ser vê bingehê li rojava cih digrin. Lê mixabin êrişên ku Tirkiyê li ser gelê me dike bi erêkirina herdû hêza ye; li hember êrişên ji bo zindîkirina DAIŞ'ê û tinekirina destkeftiyên kurdan jî bê dengin. Xuyaye ku Emerîka rê li pêşiya êrişên Tirkiyê vekiriye. Ev bêdengî hevkariya wan ya bi Tirkiyê re dide nîşandan. Ji bo wê jî gereke wek gelê bakur û rojhilatê Sûriyê em helwesta xwe li hember wan bidin nîşandan."

Zelal Ceger di dawiya axaftina xwe de got, divê gelê bakur û rojhilatê Sûriyê li hemberî êrişên ser destkeftiyên Kurdan, têkoşînê xurttir bikin û destkeftiyên vê şoreşê yên bi felsefeya Rêbertiyê hatîn bidestxistin, biparêzin. Çimkî her kes dizane ku, bê gelê Kurd çareseriya pirsgirêka Rojhilata Navî nîne.



Birêz Nêçîrvan Barzanî tu li Enqerê çi dikî?

**Dilyar Cizîrî**

Di demekê de ku QSD'ê li bajarê Hesekê nû êrişa çeteyên DAIŞ'ê şkandibû û hê cenazeyên 121 şehîdên Hesekê li erdê bûn, herwiha belge derketin ku dewleta Tirkan yekser li pişt êrişa DAIŞ'ê ya Hesekê ye û pîlan li cem wan hatiye rêsan, herwiha di demekê de ku dewleta Tirkan Şingal, Mexmûr û seranserê sînorê bakur û rojhlatê Sûriyê topbaran û bombebaran dikir û gelê Kurd dikuşt; di demekê ku dewleta Tirkan êrişên xwe yên li dijî herêmên Parastinê yên Medya didomîne û çekên kîmyayî li dijî ciwanên Kurd bikar tine, Serokê Herêma Kurdistanê Birêz Nêçîrvan Barzanî serdana Tirkiyê kir û bi kujerê zarokên Kurdan re civiya. Îcar ya ji vê zêdetir sosret e, Erdoganê ku dibêje ez dostê Nêçîrvan Barzanî û malbata Barzaniyan im, Qanunên Iraqê binpê dike û navê Kurdistanê nayne ser zimanê xwe. Lewra li gorî qanûna hikûmeta Iraqê navê Kurdistanê fermî ye û ji aliyê NY û dezgehên navdewletî ve tê bikaranîn. Tinê dewleta Tirk navê kurdistanê bi lêv nake. Nêçîrvan Barzanî, dema ji bo Covid 19 peyama serxweşiyê ji Erdogan re şandî; dema pêşwaziya Barzanî dike, ragîhandina wî dibêje Serokê "Herêma Bakurê Iraqê" serdana Tirkiyê kiriye. Heger ew peyama Barzanî ji bo malbatên şehîdên komkujiya Hesekê, Şingal û Mexmûr ba wê gelê Kurd bi tevahî rêz jê re girtiba. Lê mixabin peyam ji kujeran re ye. Gelo birêz Nêçîrvan Barzanî pirsa ji te re, mane şerm e yekî min bi navê min û nasnameya min qebûl neke, ez çawa serdana wî bikim. Mane navê Kurdistanê ji bo were naskirin bapîrê te Seydayê nemir Mele Mistefa têkoşînek mezin da meşandin û şer kir. Mane malbata Barzanî bi hezaran şehîd ji bo wê yekê dan. Li vir pirsa ji te tê kirin, gelo dema tu vê helwesta Erdogan qebûl dikî û serdana wî dikî, mane tu yekser xiyanetê bi nirxên Barzaniyê mezin dikî. Li aliyê din jî di serî de min hin xalên di vê demê de bi destê Erdgoan têne kirin, rêz kirin. Ji wir ve jî mirov vê yekê dibîne, mane tu bi vê serdana xwe kuştina 121 şehîdên Hesekê yên bi destê DAIŞ'ê hatin kuştin, rewa dikî, ji ber plana êrişê li herêmên di bin dagirkirina Erdogan de hatiye amadekirin û êriş bi destê MÎT a Erdogan hatiye amadekirin. Birêz Barzanî mane bi vê serdana xwe di heman demê de tu bikaranîna çekên kîmyawî û kuştina ciwanên Şengal, Mexmûr û Rojava rewa dike. Mane wiha tu ji qatilên kurdan re dibêje "efirim destê te sax be" mane tu êriş û planên wan ên li dijî hebûna me silav dike. Ji ber wê mafê gelê kurd heye ji te pirs bike, tu çi dike, tu ji kê re xizmet dike. Birêz Barzanî ji bîr neke rûpelê dîrokê dinivîsin û di demên pêş de zêr û diravên te ji gelê Kurdistanê girtiye û pê qesir û qonax ava kirine, wê nikaribin te ji vê xezebê biparêze. Bawer bike wê Erdgoanê bûyê serçeteyê DAIŞ, El-Nusra, Ehrar El-Şam, Huras El-Dîn û bi sedan kom û girûpên dên çeteyan wê di demên pêş de tu sûdê li te û desthiladariya te nekin. Îcar bizane ji mafê gelê Kurd e pirsa tu di vê demê de li gel kujerê me çi dikî, ji te bike. Di merasîma 23 şehîdan ya Hesekê de jî ev pirs bi awayekî vekirî hat kirin!.



# `Felsefeya Rêbertiyê çareserkirina aloziya Rojhilata Navî ye`

Têkildarî tecrîda giran ya ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, malbatên şehîdan diyar kirin ku, tecrîda ser Rêbertiyê û şerê îro li dijî yekgirtina gelan tê meşandin, ji bo pûçkirina projeya Rêveberiya Xweser û berdewamiya Komploya Navneteweyî ne.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan sala 1999`an bi Komployeke Navneteweyî radestî dewleta tirkî ya dagîrker hat kirin. Dewleta tirkî ya dagîrker ev 23 sal in Rêberê Gelê Kurd Abdellah Ocalan xistiye binê tecrîdeke pir giran. Herî dawî 25'ê Adara 2021ê Rêber Abdullah Ocalan bi telefonê bi birayê xwe Mihemed Ocalan re çend deqeyan diaxive piştî wê telefon qut dibe û ji wê demê ve ti agahî jê nehatine girtin. Ne malbat, ne parêzer nikarin bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikin.

## `Çima li dijî tecrîda ser Rêbetiyê cîhan bêdeng e!`

Derbarê mijarê de dayîka şehîd Ciwan yê 5`ê Çileya 2014an li Til Berek şehîd bûyî Henîfa Abdul-



lah got, tecrîda li ser Rêbertiyê li ser tevayiya gelê Kurd û Rojhilata Navî ye.

Yadê Henîfa axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo şkandina vîna gelê Kurd ji aliyekî tecrîdê li ser Rêbertiyê pêk tîne û ji aliyekî din ve jî êrişî herîmên me dike. Armanc ji tecrîdê tinekirina fikir û felsefeya Rêber APO ye. Herwiha dixwaze bi êrişan jî aramî û yekîtiya biratiyê li bakur û rojhilatê Sûriyê, têk bibe. Lê bila dewleta tirkî û cîhan tev bizanin, heta yek ji me hebe emê doza azadiya Kurdistanê bikin. Emê li ser şopa şehîdên xwe û fikir û felsefeya Rêbertiya xwe bijîn."

Henîfa Abdullah got, banga min ji bo tevayiya gelê Kurd heye ku li keda Serokê Neteweyî Rêber APO xwedî derkevin. Ne tang û topên dewleta tirkî ya dagîrker ne jî siyaseta hêzên nevdewletî, dikarin me tine bikin.

Ji bo rakirina tecrîdê, gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi çalakiyên cuda dadikevin qadan û bi sloganan tecrîdê şermezar dikin. Herwiha li bakurê Kurdisatê jî bi sedan girtiyên zindanan ji bo rakirina tecrîdê û azadiya Rêber Abdullah Ocalan, bi mehan e di



gireva birçîbûnê de man û niha jî têkoşîna xwe ya qebûlnekirina tecrîd û işkenceya dewleta tirkî dewam dikin.

## ` Cihê kesayeteke mîna Rêber APO ne zîndan e `

Herwiha hevjîna şehîd Ciwan ya bi navê Nûrda Mihemed jî diyar kir ku, dewleta tirk ya dagîrker dixwaze bi tecrîdê gel ji Rêbertiyê ji hev qut bike û vîna wan bişkîne.

Nûrda axaftina xwe wiha domand: "Ne ji mafê ti kesî ye, ne jî yê ti hêzê ye ku vê biryara tecrîdê li ser Rêbertiya me pêk bîne. Cihê kesayeteke mîna Rêber APO ne zîndan e, lewra fikir û felsefeya Rêbertiyê kilîta aloziya Rojhilata Navî ye."

Nûrda Mihemed axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Banga min ji gelê Kurd herwiha gelê azadîxwaz re heye ku ne tinê ji bo rakirina tecrîdê, ji bo azadiya Rêber APO têkoşîna xwe xurttir bikin. Bila hesreta dîtina Rêbertiyê ya di nava me, ji dilê me derkeve. Azadiya Rêbertiyê, xwedîderketina li xwîna şehîdan e."

# Wê qehremaniya QSD`ê her tim planên dagîrkeran pûç bike

**Jiyan Ebas-Qamişlo**

**Endama Kongreya Star Menîca Heyder êrişên dewleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û got, dewleta tirkî bi êrişên xwe nikare îradeya me bişkîne û projeya me ya demokratîk têk bibe.**

Bi armanca şkandina vîna gelên herêmê û têkbirina projeya biratiya gelan, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de, dagîrkerî û çeteyên wê, gefên xwe li ser herêmê zêde dikin û ji bo qirkirina gelên herêmê bi hêzên navdewletî re di nava bazarê de ye.

Derbarê mijarê de Endama Kongreya Star Menîca Heyder, diyar kir ku ji destpêka krîza Sûriyê ve, dewleta tirkî ya dagîrker gefên dagîrkirinê li herêmên bakur û



rojhilatê Sûriyê dixwe û axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî ya dagîrker, dixwaze xwe li bakur Sûriyê bi cih bike û siyaseta xwe li ser vê bingehê dide meşandin. Tirkiye li ser asta Rojhilata Navî wek dewleteke neteweperest û faşîst tê nasîn. Her dem hewl dide vegere serdema Osmaniyan û herêmê bixe binê desthilata xwe. Rayedarên Tirk li dû xeyalên dagîrkirinê ne û bi şev û roj planan saz dikin. Dewleta tirkî ya faşîst dixwaze ji krîzên Rojhilata Navî sûdê bigire û dagîrkirina xwe li herêmê fireh bike."

## `Armanca sereke ji êrîşan têkbirina projeya Rêveberiya Xweser e`

Menîca diyar kir ku li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê siyaseteke qirêj tê meşandin û wiha axaftina xwe domand: "Destê gelek aliyên herêmî û navneteweyî di vê siyasetê de heye. Lê dewleta tirkî ya dagîrker di van polîtîkayan de rola sereke dilîze. Istixbarata hikûmeta Şamê jî di van komplo û siyasetan de cih digire û ev yek di bûyera vê dawiyê ya zindana Sînaa ya Hesekê nîşan da. Armanca sereke ji van êrişan têkbirina projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Lewra ev proje li dijî zihniyeta şovenîst e ku bi sedê salan e li herêmê serdest e."

Menîca Heyder di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Dijminên me bi sedsalan e dixwaze îradeya me bişkîne. Ji ber vê yekê em dibînin ku ji hemû aliyan ve êrişî me dikin. Dewleta tirkî ji bo şikandina projeya me hêzê dide çeteyên DAIŞ'ê. Lê qehremaniya ku hêzên QSD'ê nîşan didin, her tim van planan pûç dike û nahêle ku bigihin armanca xwe."

## `Emê li ser axa welatê xwe bimînin û destkeftiyên şehîdên xwe biparêzin`

Menîca Heyder teqez kir ku dewleta tirkî çiqasî êrîşên xwe zêde bike wê ti carî nikaribe bi êrişên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê îradeya wa bişkîne û berxwedana gelê wa bidawî bike û got, emê bi îrade û hêza xwe li hemberî van êrişan bisekinin, destkeftiyên şehîdên xwe biparêzin û li ser xaka welatê xwe bimînin.

## `Yekîtya gelên herêmê wê serkeftinê misoger bike`

Menîca Heyder êrişên dagîrkeriya tirkî wek dewama planên parçekirina xaka Sûriyê bi nav kir û wiha axivî: "Dewleta tirkî ya dagîrker li ser gelên Sûriyê polîtîkayên qirêj dimeşîne û ev bûye sedema wêranbûna Sûriyê. Dixwaze projeya xwe ya dagîrkirinê fereh bike û careke din derfetê bide çeteyên DAIŞê ku li ser xaka Sûriyê bihêz bibe û komkujiyan bike."

Menîca bal kişand ser girîngiya projeya Neteweya Demokratîk ya çareserkirina pirsgirêkên herêmê û axaftina xwe wiha qedand: "Proje û fikrê Neteweya Demokratîk, ji gelên Rojhilata Navî re xelasiya ji dagîrkerî û serdestiyê ye. Ji ber wê divê gelên herêmê li gorî wê xwe pêş bixin û nirxên hatîn bidestxistin biparêzin.

## Tirkiye, dixebite paşroja Sûriyê jî tarî bike



**Zekî Bedran**

Serçeteyê DAIŞ`ê yê nû li herêma di binê parastina dewleta tirkî de hat kuştin. Berî niha Bexdadî jî li nêzîkî sînorê Tirkiyê û di binê parastina wê de hatibû kuştin. Sereçeteyên DAIŞ`ê baş dizanin ku di hedefa Amerîka, Koalisyonê herwisa Rûsya û rêveberiya Şamê de ne û li wan diğerin. Degel wî qasî bi çi baweriyê li Sûriyê dimînin? Hêzên dinyayê yên herî mezin li Sûriyê ne û tev jî dijminên DAIŞ`ê ne. Ji bo mayîna wan li herêmekê pêdiviya wan bi alîkariyê heye. Mal û gundên rêveberên DAIŞ`ê lê dimînin ne ji aliye hêzên leşkerî yên DAIŞ`ê ve tên parastin. Wê deme xwe dispêrin kê? El Nusra? Ne mûmkin e. Lewra yên El Nusra jî bi rê ve dibin di hedefê de ne û nikarin serçeteyên DAIŞ`ê biparêzin.

Çawa ku bi hêsanî wê bê fêmkirin DAIŞ di binê parastina dewleta tirkî de ye. DAIŞ wan herêman ji bo xwe ewle dibine. Lê dema hêzên weke Amerîka êrişî wan dikin nikarin li wan xwedî derkevin. Dema dewleta tirkî li ser sûc tê girtin û têkiliya wê ya bi DAIŞ`ê re diyar dibe, daxuyaniyê dide û diyar dike ka çiqas li hemberî DAIŞ`ê têkoşînê dike. Derew û durûtî bûye taybetiya Erdogan û rêveberên dewleta tirkî. Dema DAIŞ`ê êrişî Hesekê kir herêmên di binê dagîrkeriya Tirkan de pir hat bikaranîn. DAIŞiyên di şer de hatîn girtin gelek tişt gotin. DAIŞî pir bi hêsanî dikarin bikevin herêmên dagîrkirî û derkevin. Li wir dikarin amadekariya xwe bikin û bimînin. Herêmên dagîrkirî ji bo wan herêmin ewle ne.

Dewleta tirkî li Sûriyê di nava her kare qirêj û tarî de ye. Ne tenê di navê de ya di navenda wan de ye. Li Sûriyê dema şer dest pê kir rêveberiya Erdogan sînorê xwe ji hêzên çekdar re vekir. Bi hezaran DAIŞî ji gelek deverên dinyayê derbasî Sûriye û Iraqê bûn. Sûriye xistin nava gereke bixwîn. Sûriye hat talankirin. Ya serkêşî ji vê re kirî dewleta tirkî bû.

Lê rêveberiya Erdogan bi vê têr nebû. Bi lihevkirina bi Amerîka û Rûsya re dest bi dagîrkirina erdê Sûriyê kir. Bi dagîrkirina Efrînê û Serê Kaniyê nesekinî. Çiqas kiryarên dermirovî hene imzeya xwe avêt binê tevan. Li herêmên Kurdan dest bi qirkirina neteweyî kir. Li dinyayê serkêşiya dijminiya Kurdan domand. Yekê Sibatê Êzîdiyên ji komkujiyên DAIŞiyan rizgar bûyîn û Şingal bi balafiran bombebaran kirin. Heman şevê kampa Mexmûrê jî bombebaran kir. Lê ne ev tenê êrişî herêma Dêrikê ya Rojava jî kir. Sedema bingehî ku ji destpêkê ve dewleta tirkî êrişî Rojava dike dixwaze destkeftiyên Kurdan ji holê rake û wan tine bike.

Dewleta tirkî bi serê xwe nikare li Sûriyê bixe û dagîr bike. Hêza wê têrê nake. Lewra hêzên dinyayê yên mezin lê bi cî bûne û qada hewayî di navbera xwe de dabeş kirine. Bi qada hewayî Tirk nikarin bikevin Sûriyê û şer bikin. Eger em bala xwe bidinê çeteyên li dora xwe kom kirin di parastina herêmên dagîrkirî de bi kar tîne. Wan di şer de dide pêş û dide kuştin. Leşkerên xwe nadin pêş. Ev çete bi serê xwe derbarê paşroja Sûriyê de nikarin yek biryarê bidin. Tev di destê Tirkan de piyon in. Çawa ku hat dîtin şandin şerê li Libya û Ermenistanê jî.

Dewleta tirkî ji bo tinekirina Kurdan û temamkirina stratejiya qirkirinê, li rex şer armancên wê yên din jî hene. Li herêmê qeyraneke mezin heye. Iraqû Sûriye lewaz bûne. Dixwaze ji vê sûdê bigire û li Rojhilata Navî serdestiyê ava bike. Li Rojhilata Navî û Sûriyê çiqas aIxwanî hene tev kişandine cem xwe. Herwisa çeteyên El Nusra, DAIŞ`ê jî li herêmên dagîrkirî kom kirine. Wan hem ji bo êrişa ser Kurdan bi kar tîne, hem li hemberî dewletên erebî kirine amûrên gefxwarinê. Ji bo Sûriyê jî planên wê yên taybet hene. Dibêje, êdî ti kes bê min nikare li Sûriyê gavê biavêje. Di vê gotina xwe de rast dibêje. Bi taybetî Rûsya bi politikaya xwe Tirkiye kirye xwediya Sûriyê û şirîkê wê. Tirkiye bi awayekî eşkere bi navê El Nusra diaxive. Ji bo parastina wan bi dehhezaran leşkerên xwe xistine wir.

Li hemberî artêşa Sûriyê ji çeteyan artêşekê ava dike. Li herêmên dagîrkirî bi dehhezaran çete bi cî kirine. Vê bi xêra bavê xwe nakin. Ku Sûriyeya nû radestî wan neke jî dixwaze wan bike şirîkên desthilatdariyê. Li dû wê ye ku li Sûriyeya nû bibe xwedîgotin. Ji ber wê her tim dixebite ku nava Sûriyê tevlîhev bike û qeyranê kûrtir bike herwiha pêşiya hewldanên aştiyê bigire. Bi kurt û cewher rola Tirkiyê ya bingehî ya li Sûriyê ne çêkirin xerabkirin û birêxistinkirina xerabiyê ye.